



DAHÛRANDINA WERGERA KURDÎ YA HEFT HAÏKÛYÊN JACK KEROUAC LI DOR MODELA ANALÎZA TEKSTÊ YA WERGER-NAVEND A CHRISTIANE NORDÊ*

Sami ÇELİKTAŞ & M. Zahir ERTEKİN

Analysis of Kurdish Translation of Seven Haikus by Jack Kerouac within The
Framework of Christiane Nord's Translation-Oriented Text Analysis Model

Jack Kerouac'ın Kürtçe Yedi Haiku Çevirisinin Christiane Nord'un Çeviri-Odaklı Metin
Analizi Modeli Çerçevesinde İncelenmesi

Sami ÇELİKTAŞ

ORCID: 0009-0005-3190-7179 | samiceliktas030@gmail.com
Dr., PhD Graduate, Department of Kurdish Language and Culture,
Bingöl University, Türkiye.

M. Zahir ERTEKİN

ORCID: 0000-0003-3519-9892 | zahirertekin@hotmail.com
Prof. Dr., Department of Kurdish Language and Literature, Mardin
Artuklu University, Türkiye.

Citation/Jêgir/Atîf:

Çeliktaş, S. & Ertekin, M. Z. (2024). Dahûrandina wergera kurdî ya heft haikûyên Jack Kerouac li dor modela analîza tekstê ya werger-Navend a Christiane Nordê. Kurdiyat (10), 7-24. DOI: 10.55118/kurdiyat.1489912

Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 25.05.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 25.09.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Tarafî
Kör Hakemlik-İki hakem

Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu
makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanin û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin./ Bu çalışmaya yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:

The authors acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vekişînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jêr lisansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

* Ev gotar, ji beşeke teza doktorayê ya bi navê "Wergera Edebi di Kurdi de: Dahûrandineki li dor Modela Wergerê ya Christiane Nordê" hatiye amadekirin.

Kurte

Cureya haikûyê nerîteke helbestê ya edebiyata Japonî ye û ji hêla teşe û naverokê ve xwedî taybetiyên xwemalî ye. Nimûneyên vê cureya helbestê ji sedsala 19an û pê de li nav edebiyatên cîhanê jî diyar bû. Nimûneyên wergerê yên haikûyan, ji hêla hejmarê ve kêm be jî, li wan salên dawî di edebiyata Kurdî de jî xuya dibin. Haikûyên Amerîkî ji hêla teşe û naverokê ve ji nerîta haikûya Japonî cuda dibin. Di vê pêwendiyê de taybetî û şêwaza wergerên Kurdî yên haikûyan û têkiliya wan a bi haikûyên resen, dibe mijareke lêkolînê. Di vê xebatê de, li dor modela Christiane Nordê ya bi navê *analîza tekstê ya werger-navend* me wergerên Kurdî yên heft haikûyên Jack Kerouac nirxandin. Me bala xwe da ser tercîh û pêşekiyên wergêr, da ku em karibin rêbaza wergêr şirove bikin. Di çarçoveya modela Nordê de jî me hokarên navmetnî û dermetnî li ber çav girtin, da ku em fonksiyon û hevtayîya edebî ya teksta jêder û teksta armanc bi şikleki berawirdî binirxînin. Bi dahûrandina wan wergeran, me armanc kir ku em têkiliya haikûyên resen û yên wergerandî ronî bikin, di çarçoveya şêwaz û cureya haikûyê de hevtayîya edebî ya haikûyên jêder û yên armanc destnîşan bikin û wergera wan haikûyan rexne bikin.

Peyvên Sereke: Wergera edebî, Wergera helbestê, Haikû, Jack Kerouac, Christiane Nord, Analîza werger-navend.

Abstract

Haiku is a type of Japanese poetry and is unique in terms of form and content. From the 19th century onwards, this genre has appeared in international literature as well. In recent years, examples of haiku translations have appeared in Kurdish literature, although they are few in number. American haiku differs in form and content from the Japanese style of haiku. In this relationship, the peculiarities and the style of the Kurdish translations of haiku and their relationship to the original haiku have become a subject of research. In this article, based on Christiane Nord's model, called translation-oriented text analysis, we discuss the Kurdish translations of Jack Kerouac's seven haikus. We focus on the translator's preferences and priorities in order to interpret the translator's style of translation. Within the framework of Nord's model, we consider intratextual and extratextual factors to evaluate the translations and the literary equivalence of the source and target texts. This study aims to clarify the relationship between the original haikus and the translated haikus. This is achieved by demonstrating the resemblance between the source haikus and the target haikus in terms of style and type. Additionally, the study critiques the translations.

Keywords: Literary translation, Poetry translation, Haiku, Jack Kerouac, Christiane Nord, Translation-oriented analysis.

Özet

Haiku tür olarak Japon edebiyatının dünya edebiyatına sunduğu biçim ve içerik bakımından benzersiz bir şiir türüdür. Bu şiir türü 19. yüzyıldan itibaren diğer ulusal edebiyatlarda da ortaya çıkmaya başladı. Kürt edebiyatında son yıllarda her ne kadar sayıca az da olsa haiku tercümelemlerinin örnekleri ile karşılaşmaktayız. Amerikan haiku örnekleri ise biçimsel özellikleri ve içerikleri bakımından Japon haiku tarzından farklıdır. Bu bağlam içerisinde haiku'nun Kürtçe çevirilerinin özellikleri, üslubu ve kaynak haiku eserleri ile ilişkisi araştırmaya değer bir konu haline gelmiştir. Bu çalışmamızda Christiane Nord'un *çeviri odaklı metin analizi* adı verilen modelinden yola çıkarak Jack Kerouac'ın yedi haiku eserinin Kürtçe çevirileri ele alınmıştır. Çevirmenin çeviri tarzını yorumlayabilmek için çevirmenin tercihleri ve öncelikleri üzerinde durulmuştur. Nord'un modeli çerçevesinde metin içi ve metin dışı faktörleri dikkate alarak kaynak ve erek metinlerin edebi eşdeğerliğini değerlendirdik. Bu çalışmamıza konu olan haiku çevirilerin analizi yoluyla kaynak haiku ile erek haiku arasındaki ilişkiyi, kaynak haiku ile erek haiku arasındaki benzerliği haiku'nun üslup ve türü bağlamında açıklığa kavuşturmayı amaçladık. Ayrıca çevirilere dair eleştirilerimizi de ortaya koyduk.

Anahtar Sözcükler: Edebiyat çevirisi, Şiir çevirisi, Haiku, Jack Kerouac, Christiane Nord, Çeviri odaklı metin analizi.

Destpêk

Werger hem wekî bikereke veguhestinê ya navbera ziman û edebiyatan hem jî wekî parçeyêke navxweyî ya edebiyatê, xwedî cih û fonksiyoneke giring e. Cihê wergerê, fonksiyon û bandora wê ya di nav edebiyata Kurdî de mijareke hêjayê lêkolînê ye. Ji bo diyarkirina cihê wergerê û rengvedana wê ya di nav edebiyata Kurdî de, ji bilî xebatên lêkolînê, pêwîstî bi analîza berhemên werger jî heye. Analîza wergeran jî bivê nevwê xwe dispêre teorî, model an jî têgihên wergerê yên xwedî pênaseyêke hevpar. Bi rêya analîzên wergeran, ku li gor model û teoriyên wergerê pêk tên, derfetên nirxandinê yên gelemperî û yên spesîfîk bi dest dikevin. Ev xebat bi modela Nordê, li ser çend nimûneyên wergera cureya haîkûyê radiweste.

Wergera helbestê di nav wergera cureyên edebî de xwedî ciheke berbiçav e û bûye mijara niqaşên cihêreng. Zimanzan û wergernasan derbarê gengaziya wergera helbestê de angaşên cihê pêşkêş kirine. Yek ji hokarên ku helbestê ji cureyên din cuda dike xasyeta vê ya zimanî ye ku di vê xasyeta zimanî de rûxsar û naverok bi awayekî taybet bi hev ve girêdayî ne. Berevajî cureyên din, ziman di helbestê de bêtir metaforîk e. Ji bilî naveroka pir-wateyî û pir-qetmanî, forma estetîk jî di helbestê de taybetiyeke bineci e ku gelek caran tercîhên wergêran sînordar dike. Ji ber dijwarî û arîşeyên wergera helbestê gelek hewldanên teorîk û pratîk çê bûne ji bo hêsankirin û guncavkirina wergera vê cureyê. Pêgirên teoriyên wergerê yên ciyawaz li gor pêşekiyên xwe hin teorî û bi wan re jî peywendîdar hin stratejî û taktîkên wergera helbestê pêşkêş kirine.

Haîkû wekî cureyêke helbestê aîdî nerîta edebiyata Japonî ye. Wekî cure xwedî şêwazeke taybet a form û naverokî ye. Di sedsala 20an û pê de nimûneyên haîkûyê di edebiyata gelên din de jî tê dîtin ku yek ji wan jî edebiyata Amerîkî ye. Nimûneyên haîkûyê li wan deh salên dawî di edebiyata Kurdî de jî xuya bûn û çend nimûneyên wergerê yên ku wergêr Sidîq Gorican ji zimanê Îngilîzî wergerandine di kovarên edebî yên wekî Bar Helbest û LEWergerê de hatin weşandin. Di vê gotarê de em ê wergera heft haîkûyên haîkûnûsê Amerîkî Jack Kerouac bikin keresteyên dahûrandinê. Di beşa yekem de em bi dorê li ser wergera edebî, wergera cureyên edebî û wergera helbestê rawestiyên. Di beşa duyem de me cih da teoriya C. Nordê û nêrînên wê yên bingeîn rave kirin. Di beşa sêyem de me li dor teoriya navborî ya C. Nordê analîza nimûneyên haîkûyan kirin. Ji bo dahûrandinê me wergera Kurdî ya heft haîkûyan bijart ku ji hêla wergêr Sidîq Gorican ve hatine çêkirin.

1. Wergera Cureya Helbestê di Nav Wergera Edebî de

Pênasekirina wergera edebî bi şêwaza wergerandinê û li gor cureya teksta wergerandî di ser nimûneyêke wergerê re tê kirin. Baker (2001: 127) wergera edebî wekî berhema wergêrên edebî, pênase dike û xwedî vê angaşê ye ku divê ravekirina wergera edebî ji vê pênaseyê dest pê bike. Toury (1995: 175) wergera edebî (literary translation) wiha disenifîne: a) wergera berhemekê ya ku teksta jêder wekî berhemeke edebî hatiye qebûlkirin û b) wekî şêwazeke wergerê ku, teksta jêder bi çî cureyê be jî, di encamê de teksta armanc wekî teksteke edebî tê qebûlkirin. Li gor Ghazala (2015: 135) wergera edebî şêweyêke taybet a wergerê ye ku bi tenê ji wergera cure û jêr-cureyên edebî re têkildar e û hemî xasyetên edebî û şêwaza afirîner a berhema resen li ber çav digire. Riffaterre (1992: 204-206) diyar dike ku bingeha cudabûnê ya wergera edebî ya ji wergera

giştî ew e ku bikaranîna zimên a di edebiyatê de ji bikaranîna gelemperî cihêtir e.

Nêrînên Walter Benjamin (1992: 71-76) rêya gelek niqaş û nirxandinan vekiriye derbarê wergera berhemên edebî de. Li gor Benjamin werger xasyeteke teşeyî ye û ji bo ku mirov wergerê wekî teşe fêhm bike divê mirov bala xwe bide ser berhema resen. Wekî pirsên sereke divê mirov wan bipirse: ‘gelo ew berhem a wergerandinê ye? û ‘ji ber çî sedemê wergera wê pêwîst dike? Li gor Devy (1999: 183) werger wekî berhemên resen nayên dîtin, ji ber vê yekê estetîka wergerên edebî jî tê paşguhkirin. Lê belê, her ku berhema edebî nivîseke aşopî ye û sêwirîna nivîskar di hewînê, bi heman awayî wergera wê berhemê jî divê wan xasyetan li ber çav bigire. Li gor House (2018:15) di berhemên edebî de teşeya zimanî (linguistic form) bi awayekî rasthatinî xuya nabe, an ku xwedî armancake estetîk e, lewma jî di wergerandina wan berhemên de teşeya berhemê divê faktoreke esasî ya wergerê be.

Landers (2001: 118-131) derbarê taybetiyên wergera edebî de balê dikişîne ser sê xalan ku di wergera edebî de dibin sedemê hin kêşeyan. Yek ji wan wergera tekstên kevn e ku wergêr di zimanê armanc de ji bijartina peyv û gotinan bigire heya kêşeyên bi anakronîzm û arkaîzmê re têkildar, neçar dibe ku gelek tiştan çareser bike. Xala duyem ku ew qal dibe hebûna jêrtekst (sub-text) an e di berhemên edebî de. Jêrtekst wateya sergirtî ya berhemên edebî didin kifşê, lewma jî giring e ku wergêr jêrtekstê, an ku wateya sergirtî ya berhemê, li ber çav bigire dema ku berhemê bi zimanê armanc ji nû ve diafirîne. Landers (2001: 130-131) behsa wergera nerasterast (indirect translation) jî dibe ku ji ber hin şert û mercên taybet û ji hin neçariyan derdikeve holê.

Di lêkolînên wergera edebî de *cureya edebî* (genre) û *cureya tekstê* (text type) du têgehên giring in. Her ku qesta bi wergera cureya edebî wergera cureyên wekî helbest, çîrok, roman û yê din e, cureya tekstê berhemên ku ne edebî ne jî digire nav xwe. Ev her du têgeh di heman demê de ji bo kifşekirina tîpolojîya teksta wergerê jî kartêker in, lewre wergernas hem di pênasekirina kêşeyên wergerê de hem jî di pêvajoya wergerandinê de ji bo bijartina stratejiyên guncav girîngiyê didin tîpolojîyê. Di nav teoriyên fonksiyonel de, bi taybetî di nêrînên K Reiss, H. J. Vermeer û C. Nordê de têgeha cureya tekstê xwedî ciheke navendî ye. Reiss û Vermeer (2014 [1984]) li gor fonksiyonên wan, tekstan dabeş dikin û sê tîpolojîyên sereke destnîşan dikin: *tekstên agahîdêr* (informative), *tekstên derbirînî* (expressive) û *tekstên kartêker* (operative). Ew tekstên edebî dixin bin sernavê tekstên derbirînî ku berhemên bi vê cureyê xwedî hemanên estetîk in û bi armanca bandoreke estetîk hatine nivîsandin. Li gor Nordê (1997: 27-31) armanca nivîsîna tekstekê, xwînerên armanckirî yê wê tekstê û armanca wergerandina wê, tev ji nêzik ve bi cureya tekstê re têkildar in. Dema ku mirov di vê çarçoveyê de li ser cureya tekstê bifikire, cureya tekstê hem xasyeteke têkildarî niyeta nivîskar û berhemê ye, hem bandorê li ser xwînerê çê dibe û hem jî helwesta aktorên wergerê kifşe dibe.

Reynolds (2011: 62) derbarê cureyan de diyar dibe ku ew azmûneke hevpar a xwendinê ji girseyên berfireh ên xwîneran re dabîn dikin û vê yekê jî bi qalib û gotinên hevpar pêk tînin. Armanca û fonksiyona tekstekê cureya tekstê diyar dibe û lewma jî Munday (2001: 75) wan her du faktoran ji bo wergêr wekî taybetiyên herî giring dibîne ku divê di pêvajoya wergerandinê de li ber çav bigire. Ji hêla wergerê ve, giringiya cureya edebî ya tekstekê ya esasî ev e ku bê ka

bandoreke çawa li ser tercih û stratejiyên wergerandinê dike û keşeyên çawa yên berbiçav derdixe holê. Keşeyeke sereke ya têkildarî cureya tekstê jî ew e ku carinan berginda cureyeke edebiyata jêder di edebiyata armanc de peyda nabe. Li gor Woodstein (2022: 6-9) wergêr ne bi tenê nivîskar û teksta wî/ê radiguhezîne lê di heman demê de cureyeke edebî jî radiguhezîne û ji bo vê yekê jî divê wergêr hem di çanda jêder de û hem jî di çanda armanc de ji cureyan beled be da ku stratejiyên guncav ên wergerandinê bikare bibijêre. Her çî qas sînoren diyar ên ku cureyên edebî ji hev cuda dikin hebin jî, hin caran nivîskar wan sînoren an jî xasyetên cureyî bin pê dikin, lewre wergêr divê bala xwe bide ser dibetiyên bi vî rengî jî.

Wergera helbestê di dîroka wergernasiyê de bûye mijara niqaşên cihêreng û zêdetir jî li ser pêkanî û nepêkaniya wergera helbestê gengeşî çê bûne. Angaştên ku nepêkaniya wergera helbestê derdixistin pêş di nav demê de lawaz bûn, lê belê kesên ku pêkanbûna wergera helbestê red dikirin dîsa jî xwedî îdiayên xurt bûn. Angaştên sereke her wekî Shi (2012: 3) destnîşan dike ew e ku helbest bi destkariyê bedewiya xwe wînda dike, lewre werger jî cureyeke destkariyê ye. Di pratîkê de ew angaşt nebû astengî ji bo wergera helbestê, lê bû sedemek giring ku wergera helbestê ji wergera cureyên din cudatir bê dîtin. Di warê niqaşên têkildarî nepêkaniya wergera helbestê de nêrînen S. Bassnett hêjayî qalkirinê ne. Bassnett (1998: 57-58) balê dikişîne ser nêrînen neyînî yên derbarê pêkaniya wergera helbestê ku di nav wan de gotina navdar a Robert Frost heye her ku dibêje ‘helbest ew tişt e ku di proseya wergerê de wînda dibe’. Bassnett wan fikrên ku helbestê wekî ‘tiştêkî ku dest lê bikeve dê xirab bibe’ û helbestvan jî wekî ‘kesekî xwedî xasyetên bijarte’ dibînin rexne dike. Li gor Bassnett (1998: 58), baweriya ku helbestê wekî tiştêk ‘nayê wergerandin’ qebûl dike ji wê pîrozî û hêjabûna pirolekirî ya statuya helbestvan a di serdema romantîk de tê. Helbestvan wê demê xwedî gelek rol û qîmetên din ên bilind bûn û gotina wan jî dibû tiştêkî giran û neguherbar.

Wechsler (1998: 19) balê dikişîne ser rewşa berhemên têkûz ên edebî ku sînoren zimanan nas nakin û dibêje ku berhemeke hêja piştî wergereke normal jî dîsa şewq dide, lê eger ew berhem helbest be, hingê dibe ku piştî wergerandinê bi qasî berê wekî berhemeke gewre şewq nede. Ev nêrîn rewşa hesas a helbestê ya li hember wergerê nîşan dide. Estetîka helbestê di pêvajoya wergerandinê de bêtir tûşî xeterên xirabûnê tê li gor berhemên pexşankî. Ev yek jî ji ber xasyeta zimanê helbestê tê. Li gor şayesandina Baker (2001: 171) helbest di nav cureyên edebî de ya herî yekgirtî, tîr û bilind e. Di vê cureya nivîsa edebî de ziman bi şiklekî nerastrast tê bikaranîn, û şikl û naverok bi awayekî ku ji hev neqetin bi hev re pêwendîdar in.

Baker (2001: 171) di çareserkirina kêşeyên wergera helbestê de du helwestên sereke dest nîşan dike. Ji wan helwesta pragmatîk ranêzikiya wergêran nîşan dide û zêdetir têkildarî karên pratîkî yên wergerê ye. Helwesta teorîk jî girêdayî modelên teorîk in ku piranî ji hêla zimanzanan hatine pêşxistin. Têkildarî çareseriyên pratîkî Babler peywira sereke ya wergêrê helbestê wiha dest nîşan dike: “Ji aliyekê ve wergêr divê ji helbesta bi zimanê jêder helbesteke nû bi zimanê armanc bifirîne, û ji aliyê din ve jî hindî ku ji dest hat divê wate, deng û musîqaya helbesta resen biparêze” (1970: 194). Her çî qas destnîşankirina peywirê bi vî awayî karekî hêsan xuya bike jî, pêvajoya pêkanîne ewqas hêsan nîn e. Lewre Babler (1970: 194-195), ê ku ev peywir destnîşankiriye, diyar dike ku di pêkanîna vê peywirê de dê gelek guherîn çêbin. Di encamê de jî wergêr dê ji ber hin

tercîh û pêşekiyên xwe hin taybetiyên berhema resen jî bike qurbanî. Lewre pêwîst e ku wergêr divê hem rexnegirê edebî be, hem bi têra xwe zimanzan be û hem jî bi têrê şair be da ku berdêl û qurbanîkirinên wî/wê jî kêmtir bin.

Derbarê helwesta di pêvajoya wergerandinê de û ji bo çareseriya kêşeyên wergerê Landers (2001: 98) hin pêşniyazan dike û dibêje ku beriya ku wergêr dest bi wergera helbestê bike, pêwîst e ku hin biryaran bide û hin tiştan derbarê deqa jêder kifşe bike. Berî her tiştî divê biryarê bide ka gelo ew ê wergereke bi serwa bike yan jî na, kîjan qalibên metrîk li gor reseniya helbestê ye û heviyên xwînerên armanc çi ne? Biryar her çi be jî, li dawiyê divê helbesteke hêjayî xwendinê derkeve holê. Dijwarî û xasyetên wergera helbestê her çi û çawa bin jî, wergêrên helbestê di gel dijwariya karê xwe ji wergêrên din zêdetir rastî rexneyan tên. Vanderauwera (2014: 202) di gotareke xwe de ji hêla bendewariyên xwîner/rexnegir ve nêzikî mijara rexneyê dibe. Li gor wê rexneyên derbarê wergerên edebî piranî têkildarî hêsani/dijwariya xwendina deqa wergerandî ne. Xwîner û rexnegir berî her tiştî lê dinêrin bê ka werger bi awayekî hêsan û têgîner tên xwendin an jî na. Gelek çaran xwîner û her wisa rexnegir jî derbarê guherînên zimanî û qalibên ku li zimanê armanc nayên, pir hasas in û li hember tiştên nestandart û edetî bertekan nîşan didin.

Nêrînên J. Holmes (1970: 90-97) ên derbarê wergera helbestê di lîteratura wergera edebî de li cihekî taybet dîsekine. Holmes rêbazên wergerandina helbestê bi çar kategoriyan ve dabeş kirine. Ev kategori jî bo nirxandina asta teorîk a wergerekê û ji bo dahûrandina helwesta wergêr çarçoveyeke teorîk çê dikin û ji bo analîzên wergerê jî sûdewer in. Ew çar kategoriyan ku em ê li jêr bi kurtî qal bikin ev in: *mîmetîk*, *analojîk*, *organîk* û *der-edetî*. Andre Lefevere jî di sala 1975an de xebata xwe ya li ser wergera helbestê pêşkêş kir ku ew xebat ji hingê ve bûye referanseke giring di vê mijarê de. Lefevere di vê xebata xwe de 7 stratejî kifşe kirin ji bo wergera helbestê: *wergera dengane*, *wergera rastîne*, *wergera metrîk*, *wergera nezmê ya pexşankî*, *wergera bi serwa*, *wergera nezma bê serwa* û *wergera şirovekîrî*. Ji wan heft stratejiyan her yek giringiyê dide hêleke taybet a helbestê. Helbet ew stratejî bi awayekî teqez ji hev venaqetin, lewre wergêr dikare hinek ji wan stratejiyan bi hev re bi kar bîne.

1.1. Haîkû Wekî Cureyeke Helbestê

Haîkû cureyeke helbesta lîrîk e ku ji edebiyata Japonî belavî cîhanê bûye. Di gelek edebiyatên neteweyî de, bi taybetî piştî sedsalên 19 û 20an, nimûneyên haîkûyan xuya bûne. Di wan nimûneyan de, her çi qas jî hêla teşeyê ve hin guhertin pêk hatibin jî, tê dîtî ku haîkûyê bi giştî xasyetên xwe yê resen ên cureyî parastiye (Henderson, 1990: 27-29). Her ku haîkû tûşî ziman, çand û civakên nû bûye, mijar û temayên wê jî berfirehtir bûne. Ji bilî temayên siruştî, di nav demê re hestên mirovî yê têkildarî tevgera jiyana bajêr û nakokiyên din ên civakî jî bûne mijarên haîkûyan.

Her çi qas nimûneyên haîkûyan ên ji serdemên kevntir jî hebin, Blyth (1963) dide zanîn ku Matsuo Bashō di sedsala 17an de pêşengiya vê cureya helbestê kir. Wekî peyrevên wî jî haîkûnûsên wekî Buson, Shiki, Issa û Takahama Kyoshi bûn tevkarên belavbûna cureya haîkûyê ku destpêkê li seranserê Japonyayê û piştê jî li çar aliyên cîhanê deng veda. Bandora haîkûyê jî hêla teşeyê û naverokê ve li ser tevger û helwestên cihê yê wêjeyî çê bû, wekî mînak helbesta îmajîst a edebiyata

Îngilîzî di destpêka sedsala 20an de bandor ji haîkûyê wergirt û helbestvanên wekî W. B. Yeats, Ezra Pound, Jack Kerouac û Richard Wright jî ji nêzik ve bi tradîsyona haîkûyê re têkildar bûn (Hakutani, 2009: 2-5). Di edebiyata Kurdi ya modern de helbestvanên wekî Berken Bereh, Şemal Akreyî, Xalid Elî Silêvanî, Ulku Bîngol û Kawa Nemir haîkû nivîsîne û berhemên xwe çap kirine. Li wan salên dawî haîkû di nav helbestvanên ciwan de jî dibe cureyeke popûler û nimûneyên haîkûyên Kurdi diyar dibin.

Henderson (1990: 14) haîkûya klasîk a Japonî bi çar xasyetên wê yên bîngêhîn ve pênase dike: 1) Ji 17 kîteyan pêk tê û wekî 3 rêzik (5-7-5) tê honandin. 2) Ji rewşên mirovî bêtir rewşên siruştî pêşkêşî xwînerên xwe dike. 3) Derbarê bûyereke kifşe ye, an ku rewşê bi awayekî gelemperî nîşan nade. 4) Behsa bûyereke dema *nîha* dike, an ku bûyereke *rabirdû* pênase nake. Haîkûyên Japonî wekî yek rêzik tîr nivîsandin lê bi rêya peyvekê –bi zimanê Japonî ev peyv *kireji* ye– rawes dike nav rîtmî helbestê. Bi peyvekê haîkûnûs tişteki dibire û bi tişteke din didomîne (Henderson, 1990: 18). Haîkûyên Japonî yên klasîk derbarê siruştê û demê ne, lewre di wan haîkûyan de herî zêde em rastî demsalê, danê rojê û hêmanên siruştê tîr. Dem û siruşt wekî du temayên bîngêhîn di hişê haîkûnûs de bi mîzaheke bîcoş li hev diqelîbin û dibin bîngêha ravekirina bûyereke kifşe ya dema nivîsînê an jî hestkirinê. Ev nayê vê wateyê ku di haîkûyan de mirov û rewşên tîkildarî mirovan cih nagire. Rast e ku siruşt mijara haîkûyê ya esasî ye, lê belê her wekî Yasuda (2011: 238) destnîşan dike di çand û tîgihîştina Japonan de mirov beşeke bîngêhîn a siruştê ye û hemî tiştên tîkildarî mirovan jî di nav siruştê de tîr qebûlîkin.

Xasyetên haîkûyê yên teşeyî her çî qas li pêş haîkûnûsan hin sînorên vegotinê xêz bikin jî, bandoreke erênî li ser sêwirana wan çê dikin. Ji ber vê sînorê ku bi kîte û rêzîkên kurt xêz bûye, haîkûnûs hewl didin ku bi gotinên kurt peyameke xurt çê bikin û bala xwînerê xwe bikişînin ser wate û tîgihîştineke hevgerî. Her wisa haîkûnûs gelek çaran barê wateyê ya hunera xwe datînin ser milê xwînerên xwe. Çawa ku bi gotinên hindik kirpandina wateyekê, bibîrxistina îmajekê, hevsengandina mod û tona helbestî ne hêsan be, bi heman awayî wergera haîkûyê karekî ne hêsan e. Parastina teşeya resen an jî dariştina teşeyê manendî haîkûya resen, veguhestina niyeta haîkûnûs, veguhestina peyamên haîkûnûs ên eşkere û veşartî, û ji nû ve afirandina haîkûyê estetîk tev wekî kêşe li benda wergêr in ku çareseriyekê ji wan re peyda bike.

2. Modela Analîza Tekstê ya Werger-Navend a Christiane Nordê

Nêrînên C. Nordê di nav teoriyên wergerê yên Ekola Fonksiyonel de cih digire û gelek çaran wekî model jî tê binavkirin. Nord modela xwe ya bi navê *analîza tekstê ya werger-navend* di nav ekola fonksiyonel de pênase dike. Fikrên Nordê yên derbarê wergerê xwedî xalên hevpar in li gel teoriya skopos û teoriya çalakiyê yên ekola fonksiyonel. Nord modela xwe di 2 berhemên xwe de rave dike. Berhema yekem, *Text Analysis in Translation -Analîza Tekstê di Wergerê de-* (1991), bi hûrgilî hemî nêrînên Nordê yên derbarê wergerê û modela wê digire nav xwe. Berhema duyem, *Translating as a Purposeful Activity -Wergerandin Wekî Çalakiyê Xwedî Armanc-* (1997) li ser teoriya fonksiyonel bi giştî radiweste û her wisa nêrînên wê yên derbarê teoriya skopos û teoriya çalakiyê de jî parve dike. Nord di vê berhema xwe de xasyetên fonksiyonel yên wergera edebî û mijara hevtayîyê jî dinirxîne.

Nord li destpêkê behsa pêwîstiya modeleke dahûrîna tekstê dike da ku wergêr bi vê modelê arîşeyên têgihîştina bi teksta jêder bi her awayî çareser bikin. Nord (1991: 1-2) sazkirina modeleke analîza tekstê ya werger-navend gengaz dibîne. Li gor wê, modeleke wiha divê bi tenê girêdayî referansên zimanên jêder an jî zimanê armanc nebe, lê di heman demê de jî ji bo her du hêlên wergerandinê (ji zimanê yekem ber bi yê duyem û berevajî) kêrhatî be. Her wisa divê ev model bibe çarçoveyeke teorîk ji bo xebatên wergerê, perwerdehiya wergerê û çalakiya wergerandinê. Lewre divê modela ku tê qalkirin bi têra xwe gelemper be da ku li her deqê bê sepanandin û bi têra xwe jî spesîfîk be da ku arîşeyên wergerê yê cur bi cur bikare li ber çavan bigire. Modela Nordê di heman demê de erka senifandina tekstan û nirxandin û rexneya kalîteya wergeran jî digire nav xwe.

2.1. Wergera Fonksiyonel û Rewşa Ragihanî

Nord çend xalên bingehîn dest nîşan dike ku di modela wê de xwedî rolên giring in. Ew xalên bingehîn jî wekî 1) rêgezên wergerzaniyê û 2) rêgezên tekst-linguîstîk dabeş dike. Di bin sernavê rêgezên wergerzaniyê de cih dide *hokar û hêmanên pêvajoya wergerandinê, rola destpêşxer (initiator) û rola wergêr*. Di bin sernavê rêgezên tekst-linguîstîk de jî cih dide sernavên wekî *hevbandoriya ragihanî* (communicative interaction), *pêvajoya wergirtina tekstê* (text reception) û *tîpolojîyên tekstan* (1991: 5-24). Nord diyar dike ku (1991: 6) werger pêvajoya veguhestina tekstê ya navberçandî ye. Ev pêvajo bi çalakiya destpêşxerekî/ê dest pê dike. Destpêşxer serî li wergêrekî/ê dide ji ber ku dixwaze tekstekê di zimanê armanc ji nû ve bide hilberandin. Ev tekst jî bi zimanê jêder ji hêla hilberînerê/ê ve hatiye nivîsandin an jî şanderê ev tekst ji bo wergerandinê dabîn kiriye. Di vê pêvajoyê de hokar û hêmanên sereke li gor rêza demkî bi dorê ew in: *hilberînerê teksta jêder, şanderê teksta jêder, teksta jêder, wergirê teksta jêder, destpêşxer, wergêr, teksta armanc, wergirê teksta armanc*. Hilberînerê teksta jêder (nivîskar) û şanderê teksta jêder gelek çaran heman kes in. Wergirê teksta jêder û teksta armanc xwînerên wan tekstan in.

2.2. Hokarên Analîza Teksta-jêder

Nord fonksiyona ragihanî wekî pîvana sereke ya tekstê dibîne û li gor wê taybetiyên sentaktîk û semantîk ji hêla giringiyê ve di pileya duyem de ne (1991: 41). Ji ber vê qebûla xwe jî Nord hokarên ku rewşa ragihanê (communicative function) diyar dikin wekî hokarên herî giring ên ji bo analîza teksta jêder destnîşan dike û wan wekî hokarên dermetnî (extratextual) bi nav dike. Hokarên dermetnî ên ku li gor Nordê rewşa ragihanê diyar dikin ew in: *şander (sender), niyeta şander, wergir (xwîner), navgîn/kanal, cihê ragihanê, dema ragihanê, motîva ragihanê û fonksiyona tekstê*.

Nord (42) rola wan hokaran a di rewşa ragihanê de wiha zelal dike: Nivîskar an ku şanderê tekstê bersiva (**kî?**) yê ye. Niyeta şander bersiva pirsra (**ji bo çi?**) dide. Xwînerê tekstê dibe berve, an ku beramberî bersiva (**ji bo kê?**) ye. Navgîn û kanala ku tekst pê tê ragihandin bersiva (**bi kîjan navgînê?**) dide. Cih (**li ku?**) û dem (**kengê?**) derbarê zeman û mekanek berbiçav ên ragihanê ne ku tê de tekst hatiye hilberandin û wergirtin. Motîv (**çima?**) jî sedema ragihanê nîşan dide. Bi bersiva wan pirsan tev jî bersiva faktora dawî, an ku fonksiyona tekstê (**bi kîjan fonksiyonê?**) derdikeve holê.

Nord (87-142) ji bo analîzkirin û têgihîştina xasyeta peyama nav tekstê li gel wan 8 hokarên

dermetnî yên li jor, 8 hokarên navmetnî jî destnîşan dike. Hokarên navmetnî ew in: *mijar*, *naverok*, *feraziye* (*presupposition*), *kompozîsyona tekstê*, *hêmanên ne-peyv*, *peyvşazî*, *hevoksazî* û *taybetiyên raparçeyî* (*suprasegmental features*). Hokarên navmetnî jî bi dorê mijara tekstê (**derbarê çi?**), agahî û naveroka nav tekstê (**çi?**), zanyariyên ku nivîskar wekî ferazî dihesibîne (**tiştên dîtir**), kompozîsyon û avaniya tekstê (**bi çi rêzê?**), hêmanên ne-zimanî (non-linguistic), kêlek-zimanî (paralinguistic) ku di nav tekstê de cih digirin (**bikaranîna hêmanên ne-gotinkî**), xasyetên bêjeyî (**bi kîjan peyvvan?**), avaniya hevoksaziyê (**bi hevokên çawa?**) ya tekstê digirin nav xwe. Taybetiyên raparçeyî yên întonasyon û prozodiyê (**bi kîjan tonê?**) diyar dikin. Wergêr û rexnegir di analîza wergerekê de dikare wan hokaran tev li ber çav bigire, an jî pêşekiyê bide hinekan. Di analîza hin berheman de jî, ji ber taybetiyên tekstê, hin hokar dibe ku qet bi kêrî analîzê neyên.

2.3. Rexneya Wergerê

Nord (1991: 179) destnîşan dike ku wekî edetî pirtûkek werger her wekî pirtûkek resen tê xwendin û çî dema ku dahûrînek derbarê wergera pirtûkê tê kirin jî pîranî ew li gor normên zimanî û edebî yên çanda armanc çê dibe. Bi awayekî din mirov bibêje, tiştê ku tê nîrxandin berhema wergerandî ye. Nord her çî qas modela xwe ya analîzê ya li gor hokarên dermetnî û navmetnî ji bo analîza teksta armanc guncav bibîne jî, qîma xwe bi analîzeke yekalî nayne. Li gor wê, rexneyeke wergerê ya objektîf divê hem teksta jêder û hem jî teksta armanc bi awayekî berawirdî analîz bike, cudatî û manendiyên wan destnîşan bike û proseya wergerê û stratejiyên ku hatine bikaranîn rave bike. Dîsa jî Nord (180) berawirdkirineke bi vî rengî ya teksta jêder û teksta armanc bi têrê nabîne, lewre eger berawirdkirin bi tenê di asta zimanî û şêwazî de bimîne, eger armanc û metodên wergerê nenîrxîne û şertên derveyî yên ragihanê li ber çav negire, vê çaxê ew nabe rexneyeke tam.

Nord (180-181) ji bo rexneyeke îdeal wekî pîvan destnîşan dike ku divê tê de hem analîz û nîrxandina proseya wergerê û armanca wergerê hebe û hem jî nîrxandina teksta armanc û fonksiyona wê ya ji bo armanca wergerê bê kirin. Di modela Nord de rexneya wergerê bi berawirdkirina teksta jêder û teksta armanc dest pê dike. Bi vî berawirdkirinê rexnegir derbarê proseya wergerandinê de dibe xwedî fikr; helwest û stratejiya wergêr dibîne û heta dikare armanca wergerandinê jî şirove bike. Li gor Nordê (182) di rexneya wergerê de berî her tiştî pêwîstî bi çarçoveyê teorîk û bijartina pîvanên nîrxandina wergerê heye. Ji bo kifşekirina referansên teorîk û pîvanên rexneyê, rexnegir an bala xwe dide nîşe û danezanên wergêr, an jî eger ew referans, tercîh û pîvanên wergêr eşkere nehatibin diyarkirin jî divê li gor analîzên xwe pêşbîniya tercîh û stratejiyên wergêr bike û hevgeriya wan li gor berawirdkirina teksta jêder û teksta armanc pêk bîne. Wekî rêya sêyem jî rexnegir/analîzkar divê li gor armanca wergerê ya (skopos) a ku bi xwe diyar kiriye rexneya wergerê bike.

Nord (182-183) pêvajoya rexneya wergerê bi analîza teksta armanc a li gor modela xwe dide destpêkirin, an ku ji dawiyê ber bi destpêkê vedigere. Di vî analîza teksta armanc de rexnegir dê bala xwe bidê ka teksta armanc li beramberî vî rewşa ragihanê tê ya ku ew ê de bibe xwedî fonksiyon. Ji bo rexnegir tiştê giring ev e ku tekst bi rewşa heyî bigunce, di çarçoveya armanca wergerê de fonksiyona xwe bi cih bîne û ev fonksiyon jî bi faktorên dermetnî re li hev bê. Nord di tu qonaxa rexneya wergerandinê de giringiyeke taybet nade tespîta xeletiyên wergerandinê. Tiştê

esasî ya rexneyê di modela Nordê de pêkanîna tekstê ya fonksiyon û bandorê ye.

2.4. Di Modela C. Nordê de Têkiliya Fonksiyonalîzmê û Wergera Edebî

Nord balê dikişîne ser xasyetên cuda yên ragihandina edebî û taybetiyên wê şirove dike. Li gor Nordê (1997: 80-81) şanderê teksta edebî nivîskar e û bi awayekî eşkere navê nivîskêr li ser berhemê tê diyarkirin. Eşkrebûna navê nivîskêr jî bandorê li ser rewşa wergirtinê û hêviyên xwîneran çê dike. Niyeta nivîskaran di tekstên edebî de bi awayên cur bi cur xuya dibin bes ev niyet bi vegotîneke derbirînî û di çarçoveya cîhaneke pevbestî de diyar dibin. Wergirên tekstên edebî jî xwîner in û xwedî hêvî û bendewariyên spesîfik in. Her çi navgîna teksta edebî ye, berhemên edebî piranî nivîskî ne. Derbarê hokarên wekî cih, dem û motîvê de jî Nord (81) destnîşan dike ku her çi qas ew hokar taybetiya teksta edebî û ya ne-edebî nîşan nedin jî di wergerê de ji bo diyarbûna ferqa çanda jêder û çanda armanc a ji hêla dem, cih û motîvê ve ew hokar dibin xwedî giringî.

Nord (82-84) bi taybetî balê dikişîne ser bandor û fonksiyonê, her ku cudatiya teksta edebî ji hêla wergerê ve pênase dike. Li gor Nordê (82) edebîtiya tekstê çî bi mijara berhemê be, çî bi koda edebî ya bijartî û çî jî bi nerîta zimanî re têkildar be, tiştê teqez ew e ku teksta edebî bandoreke poetîk û estetîk li ser xwînerê xwe çê dike. Ev bandor jî dibe bandora spesîfik a tekstê û her wisa dibe fonksiyona tekstê ya edebî. Bi vê bandorê qîmeta edebî ya tekstê çê dibe û li ser vê bandorê têkiliyeke edebî navbera nivîskar û xwîner saz dibe. Nord (84) wergera edebî wekî ragihandineke navber-çandî (cross-cultural) bi nav dike û vê ragihandinê jî bi çar têkiliyên bingehîn şirove dike: a) *têkiliya navbera niyeta şander/nivîskar û tekstê*, b) *têkiliya navbera niyeta şander/nivîskar û bendewariya wergir/xwîner*, c) *têkiliya navbera şander û wergir*, d) *têkiliya navbera wergir û tekstê*.

Ji bo Nordê hevsenga fonksiyonê û bandorê pir giring e di ragihana edebî ya navber çandî (cross-cultural) de û ew vê hevsengê bi têgeha hevtayiyê li gor xwe şirove dike. Li gor Nordê (89) di wergera edebî de ji wergêr tê hêvîkirin ku hevtayiyeyeke navbera teksta jêder û teksta armanc ji hêla fonksiyona tekstê û bandora tekstê ve saz bike. Lê sazkirina hevtayiyeyeke bi vî rengî hin şert û mercan pêwîst dike ku Nord (89-93) wan di bin çar sernavan de wekî çar pêwîstekên hevtayiyê (equivalence requirement) formule dike û wan pêwîstekên hevtayiyê bi hin pêwîstekên nû yên li gor ranêzikiya skoposê berawird dike. Ev çar sernav jî bi dorê *Şirove* (interpretation), *Fonksiyona Tekstê*, *Dûratiya Çandî* û *Bandora Tekstê* ye.

Di mijara şirovekirinê, an ku şirovekirina tekstê de, Nord pêwîsteka hevtayiyê wiha formule dike: Divê şiroveya wergêr her wekî niyeta şander/nivîskar be (1997: 89). Lê Nord vê pêwîstekê li gor wergereke xwedî armanc wiha formule dike: Wergêr tekstê ne tenê li dor niyeta şander/nivîskar şirove dike, lê belê ew lihevhatina tekstê ya bi rewşa zimanê armanc jî li ber çav digire (92). Ji vê formulekirina nû jî xuya dibe ku ranêzikiya Nord ji nêrîna wê ya edebî ya armanc-navend dariştiye. Nord hevtayiya ji hêla Fonksiyona Tekstê wiha formule dike: Divê wergêr niyeta nivîskar wisa bîne ziman ku teksta armanc bikare di çanda armanc de heman fonksiyonê pêk bîne ku teksta jêder di çanda jêder de kariye pêk bîne (1997: 90). Nord diwariya pêkanîna heman fonksiyonê destnîşan dike û vê pêwîstekê jî wekî: 'Divê teksta armanc bi awayekî wisa saz bibe ku fonksiyonên wê yên di rewşa armanc de li niyeta nivîskar bigunce' (92) formule dike. Vêca

wergêr ê biryarê bide bê ka kîjan fonksiyonên teksta jêder li gor niyeta nivîskar di teksta armanc de temsîl bike.

3. Dahûrandina Wergera Heft Haîkûyan

Cureya Edebî: Helbest / Haîkû

Nivîskar/Helbestvan: Jack Kerouac (1922-1969)

Wergêr: Sidîq Gorîcan

Teksta Jêder: Jack Kerouac Collected Haikus (1961)
(<http://terebess.hu/english/haiku/Kerouac-Haikus.pdf>).

Teksta Armanc: Kovara LEWeger, Hejmar 6, 2024. r. 22.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
Haiku 1 A raindrop from the roof Fell in my beer	Haîkû 1 tipikeke şiliyê ji serbanê jorê ket ket nav meya min
Haiku 2 Train on the horizon - my window rattles	Haîkû 2 trên hê li asoyê li pencereya li berê me dibe gurregurr
Haiku 3 The sound of silence is all the instruction You'll get	Haîkû 3 dersa tu distînî ev e ji hemî perweriyên - pêjna bêdengiyê
Haiku 4 Dusk - boy smashing dandelions With a stick	Haîkû 4 şevê da ser lawko pifok berba kirin bi çovê xwe
Haiku 5 Snap you finger stop the world! - Rain falls harder	Haîkû 5 şirqînê li tilî xe dinyayê çik rawestîne - baran gurrtir tê
Haiku 6 Glow worm sleeping on this flower, Your light's on!	Haîkû 6 li ser kulîlkekê va ketiye xewê gûstêrik - min tu find navê
Haiku 7 No telegram today - Only more Leaves fell	Haîkû 7 telgrafek ji tune - ya îro li me heyî pel pirtir diwerin

3.1. Analîza Hokarên Dermetnî û Navmetnî

3.1.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: Nivîskarê Amerîkî Jack Kerouac (1922-1969) wekî nivîskarekî pirhêl di gelek cureyên edebî de berhem dane, bi taybetî jî bi romana xwe ya navdar *On the Road* li seranserê cîhanê bûye yekî navdar. Li gor agahiyên ku Theado (2000) derbarê jiyana û nivîskariya Kerouac de dide, nivîskar kesayetêkî giring ê jî nifşa Beat e di wêjeya Amerîkî de. Wî romanên xwe ji çîrokên rast ên jiyana xwe saz kirine. Kerouac pêşengekî haîkûya Amerîkî ye û bi rêya haîkûyan hezkirina wî bi Bûdîzma Zen û ramanên mîstîk çê bûye. Di haîkûyên wî de jî şopên jiyana wî berbiçav in.

Niyeta Şander: Haîkûnûs hestên xwe û bertekên xwe yên demkî yên derbarê jiyana û bi taybetî yên derbarê siruştê di risteyên kurt ên haîkûyan de didin kifşê. Di haîkûyan de herî zêde hestên wekî xemgînî, şadî, ecibandî, heyîrîn, şaşmatîbûn tîn dîtin. Niyeta haîkûnûsan bi fikr û hîsiyata wan a li hember mijar û naveroka haîkûyê kifşe dibe û ew fikr û hîsiyat jî di encama çavdêriyekê de çê dibe. Rewşa derûnî ya haîkûnûsê çavdêr û bandora bûyer an jî rewşa ku ew çavdêriya wê dike, dibin faktorên avaker ên niyetê û bi peyv û gotinên parzûnkirî haîkûyek saz dibe. Theado (2000: 9) derbarê Kerouac de dibêje ku nivîskariya wî piranî otobîyografîk e. Wî hewl daye ku jiyana xwe bike bingeha hunera xwe, lewre jî rasterast ji tecribeyên xwe yên jiyana berhemên xwe afirandine. Hûrgiliyên jiyana Kerouac ên dema ku ew wan haîkûyan dinivîse rasterast bi niyeta nivîskar re têkildar e. Di her haîkûyê de fikr û hîsiyateke berbiçav heye ku wekî niyeta şander/helbestvan derpêş dibe.

18

Wergir: Wergir, an ku xwînerên haîkûyên jêder, ji dema çapbûna berhemê ya salên 1960an heya roja îro xwînerên edebiyata Îngilîzî ne. Ji ber ku xwînerên ku bi Îngilîzî dixwînin xwedî paşxaneyên çandê yên cihê ne, hêvî û bendewariyên wan ên ji haîkûyên Kerouac jî dê cihêreng bin. Dîsa jî, xwînerên ku li salên Kerouac ew haîkû nivîsîne û xwînerên ku xwedî bendewariyên hevpar in wekî xwînerên armanc divê bîn qebûlkirin. Wergirên haîkûyên armanc jî xwînerên Kurd in ku piştî çapbûna pirtûka werger derfeta xwendina wan haîkûyan bi dest xistine. Ji bo xwînerên Kurd haîkû dê wekî cure biyanî xuya bike, lê belê çend helbestvanên Kurd ên ku haîkû nivîsîne û sêxişteyên Kurdî dê li ba xwîner bendewariyekê nasraw çê bikin derbarê wan haîkûyên werger de.

Navgîn/kanal: Navgîna sereke ya teksta jêder û teksta armanc nivîs e, lewre her du tekst wekî pirtûk hatine çapkirin û di nav demê re bi vê kanalê gihîştine xwînerên xwe. Jack Kerouac hin haîkûyên xwe ji bo xwînerên xwe xwendine û dengê wî li ser platformên dijîtal ên wekî youtubeê berdest e, lê belê rewşeke wiha jî bo haîkûyên wergerandî nîn e.

Cihê Ragihanê: Haîkûyên resen li Amerîkayê çap bûn û di nav demê re bi rêya derfetên zêde yên belavkariya berhemên Îngilîzî, her wisa di ser çavkaniyên dijîtal re gihîşt seranserê cîhanê. Haîkûyên werger ji hêla kovara LEWergirê ve li Amedê çap bû û bi rêya vê kovarê derfeta xwendinê jî xwînerên Kurdî re çê bû.

Dema Ragihanê: Kerouac di navbera salên 1955 û 1969an de bi qasî 1000 haîkû nivîsîne û ji wan 72 heb bi navê *Desolation Pops* bi bijartina Kerouac çap bûn. Di wan salan de li Amerîkayê

haikû bi wergerên haikûyên klasîk hêj nû dihat naskirin. Wergera haikûyên Kerouac di Hejmara 6em a kovara LEWerger de li sala 2024an derket.

Motîv: Motîva Kerouac a haikûyan bi ceribandina cureyeke nû re û bi armanca wî ya afirandina haikûya Amerîkî re (Kerouac: 1961) têkildar e. Her wisa têkiliya nêzik a haikûyê û baweriya Bûdîzmê baş tê zanîn. Kerouac jî bi rêya haikûyê baweriya Bûdîzmê hîn dibe û meyleke wî ya ber bi Bûdîzmê û nivîsîna haikûyan çê dibe (Hakutani, 2020: 154). Motîva nivîsîna haikûyan a Jack Kerouac diyar e ku ji wê meyla wî jî tê. Ji hêla din ve, motîva wergerandina haikûyan reng e ku ji meyla edebî ya wergêr tê, her ku wergêr bi xwe haikûnûs e. Xuya ye ku wergêr xwestiye zêdetir mînan pêşkêşî xwînerên haikûyên Kurdî bike. Bi vî awayî, wergêr tevger û motîva xwe ya nivîsandina haikûyan bi wergerandina haikûyên Îngilîzî bêtir çespandiye û berdewam kiriye.

Fonksiyona Tekstê: Haikû wekî cureyeke edebî xwedî fonksiyona şayesandina hest û ramane şexsî ye. Di haikûyê de haikûnûs tecribeya xwe ya jiyane ya li dem û ciheke berbiçav û bi bûyereke spesîfik ve eleqedar radigihîne xwînerê xwe. Tekst ji hêla fonksiyonê ve, bi armanca parvekirina hest û ramana haikûnûs a bi xwîneran re xwedî roleke parvekirina tecribeya jiyane ya demkî ye.

3.1.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: Heft haikûyên ku me bijartine xwedî mijarên binas ên cureya haikûyê ne û di hemiyana de jî hêmaneke siruştî wekî biker cih digire. Her wekî xasyeteke haikûyên Amerîkî ye, rewşa mirovî jî bi pêwendiya bi siruştê re dibe mijar. Haikûyên jêder û yê armanca ji hêla mijarê ve hevgir in, an ku wergêr mijarên haikûyên resen bi heman awayî veguhestine.

Naverok: Di *haikû 1ê* de siruşt û mirov li hev diqelibin. Rijîna dilopên baranê û bîraya nav badeyê, û aşîman wekî banê malê têkiliyeke manendiyê di navbera siruştê û jiyana mirov de çê dibe. *Haikû 2* behsa aramiya siruştê dike ku bi dengê trêne tê şikestin. *Haikû 3* qala hukmê bêdengiyê dike ku mirov karibe jê fêr bibe. *Haikû 4* jî her wekî *haikû 2yê* behsa aramiya siruştê dike ku wê carê bi destê kurîkek nerihet xirab dibe. *Haikû 5* behsa neçariya mirov dike ku hindî mirov hewl bide ji bo kontrola dinyayê, dîsa jî dinya bi ya xwe dike. *Haikû 6* behsa mirovê çavtêr dike ku qîma xwe bi ronahiya ajaleke biçûk tîne. *Haikû 7* behsa aramiya mirov dike, dema ku ji navgînên teknolojiyê û ji kêşeyên rojane dûr e.

Kompozîsyona Tekstê: Haiku bi gelemperî xwedî kompozîsyoneke kifşe ne û ji hêla teşeyê ve sînordar in, lê belê sînore teşeyî yê haikûyên Japonan ku ji sê riste û 17 kîteyan pêk tê, ji bo haikûyên Amerîkî derbasdar nîn e. Kerouac (1961) diyar dike ku wî haikûyên bi şewaza Amerîkî wekî helbestên kurt û sade yê sê rêzik çê kirine.

Peyv: Di haikûyan de peyv bi piranî ji navdêr û lêkeran pêk tên. Her ku navdêrek temsîla siruştê ye û navdêreke beramber jî temsîla rewşa mirovî dike. Bi rêya lêkerê jî pêwendiya wan navdêran di konteksta bûyereke de çê dibe. Wekî nimûne, “raindrop/tipîkek baranê” û “beer/bîra” (haikû 1), “horizon/aso” û “window/pencere” (haikû 2), “telegram/telgraf” û “leaves/pel” (haikû 7) tev temsîlên bi vî rengî ne ku bi hev diqelibin.

Hevoksazî: Hevokên haikûyên resen li gor nerîta haikûyê kurt û sade ne. Lêkerên tevgerê yê

wekî “fall/ketin” (haîkû 1, 5 û 7), “smashing/berba kirin” (haîkû 4), “snap/şîrqîn, lê xistin” (haîkû 5) bi kêrî şayesandina bûyera demkî tên. Her çi qas di haîkûya Japonî de raweya demê *dema niha* be jî, di haîkûya Amerîkî de raweyên demên din jî xuya dibin. *Haîkû 2, 4, 5 û 6* bi dema niha, *haîkû 1 û 7* dema borî, *haîkû 3* bi dema bê û *haîkû 5* jî bi raweya fermanî saz bûne.

3.2. Armanc û Tercîhên Wergêr

Yek ji armancên wergêr û weşangerên Kurdî yên ku ji zimanên biyanî bo Kurdî berheman werdigerînin ew e ku berhemên edebî yên bi zimanê Kurdî zêde bibin û nivîskarên cîhanê bi zimanê Kurdî bigihînin xwînerên Kurd. Wergêr Gorîcan jî reng e ku xwestiyê cureyeke wekî haîkûyê ya kêmpayda di zimanê Kurdî de bi rêya wergerê zêde bike. Wergêr derbarê armanca xwe ya wergerandina haîkûyên Jack Kerouac de tu agahî belav nekirine, an ku armanceke rasterast a destnîşankirî tune. Wergêr bi xwe jî şairekî haîkûnûs e [Sidîq Gorîcan- Gumbil, 2022], vêca armanceke takekesî ya wekî ‘*bi nivîsîna haîkûyên resen û bi rêya wergerê temsîl û zêdekirina cureya haîkûyê ya bi Kurdî*’ divê li ber çav bê girtin. Wergêrên helbestvan gelek caran ji bo ceribandîna nivîsînê û geşkirina derfetên derbirîna xwe ya şexsî jî ji çalakiya wergerê sûd werdigirin. Ev yek jî wekî motîv û armanca wergêr a nebinavkirî dibe bê qebûl kirin.

Ji hêla tercîhên wergêr ve me xalên jêr di analîza xwe de tespît kirin: Di *haîkû 1* de wergêr “mey” li şûna peyva “bîra” (beer) tercîh kiriye. Dîsa ji bo ku peyva “roof/serban” wekî *asîman* jî bê fêmkirin, bi rêya “serbanê jor” teknîka lêzêdekirina peyvê bi kar aniye. Di *haîkû 2* de wergêr ji bo kirpandina dûrahiya trêne peyva “hê” lê zêde kiriye. Gotina teksta jêder “my window” wekî “li pencereya li berê me” guhertiye. Peyva “rattle” a ku berginda “çingînî/tingînî”ya Kurdî ye, wekî “gurregur” di haîkûyê de cih girtiye. Di *haîkû 3* de wergêr li şûna dema bê ya di teksta jêder de dema niha tercîh kiriye û rêzika yekem a haîkûya resen “The sound of silence” di teksta armanca de kiriye rêzika sêyem “pejna bêdengiyê”. Di *haîkû 4* de “dusk” ku berginda “hingûra êvarê” ye wekî “şevê da ser” bûye tercîha wergêr. Li şûna lêkera “smash” a ku wateya lêdanê dide, wergêr gotina “berba kir” tercîh kiriye.

Di *haîkû 5* de piştî gotina “stop the world” di haîkûya jêder de baneşanek heye, lê wergêr baneşan bi kar neaniye. Her wisa wergêr peyva “çik” ku berginda wê di haîkûya jêder de tune li teksta armanca zêde kiriye. Di *haîkû 6* de wergêr gotina jêder “this flower” a binavkirî bi tercîha “kulîlkek” di haîkûya armanca de kiriye tiştê nebinavkirî. Di heman haîkûyê de gotina jêder a “Your light’s on!” wekî “min tu find navê” hatiye wergerandin. Di *haîkû 7* de wergêr peyva jêder “today” ku di rêzika yekem de cih digire, di haîkûya armanca de di rêzika navîn de û bi lêzêdekirina du peyvan wekî “ya îro li me heyî” wergerandiye.

3.3. Hevtayîya Edebî û Rexneya Wergerê

Di *haîkû 1* de tercîha wergêr a peyva [mey] ku li şûna peyva [bîra/beer] bi kar aniye mimkun e ku dê du atmosferên nehevta çê bike li pêş çavê xwîner. Di çanda rojava de tercîha cureya vexwarinê derbarê atmosferê û rewşa derûnî ya mirovan de wekî nîşaneyek tê şîrovekirin. Di *haîkû 2* de bergeha vegotinê bi awayekî dramatik guheriye, an ku [my window/pencereya min] bûye [pencereya li berê me] û bi vî awayî jî ji vegotina şexsî bi dûr ketiye. Di *haîkû 3* de rêza rêzikan guheriye û bi vî awayî hêmana ku hatiye kirpandin jî guheriye; di haîkûya resen de [instructions

you'll get/perweriya tê bistîni] hatiye kirpandin, lê belê di haikûya armanc de fraza ku hatiye kirpandin [*pêjna bêdengiyê*] ye. Di *haikû 4* de ji hêla danê rojê ve û ji hêla şidbûna tevgera kurik ve ciyawazî di navbera teksta jêder û teksta armanc de çê bûye, lê belê fonksiyona demê û bandora bûyerê di haikûya armanc de bi niyeta haikûnûs digunce. Di heman haikûyê de wergêr wateya tund a lêkera jêder [*smashing/lêdan*] bi rêya peyva [*berba kir*] nerm kiriye û berê tevgera kurik ji tundiyê ber bi lîstinê guhestiye.

Di *haikû 5* de ji ber nebûna baneşanê ya piştî [*dinyayê çik rawestîne*] îmaya di haikûya jêder de [*stop the world!*] -a ku qesta wê nepêkaniya rawestandîne ye- di haikûya armanc de xuya nabe. Li şûna wê, wergêr bi lêzêdekirina [*çik*] bandoreke cuda li tevgera rawestandîne çê kiriye. Ev helwesta wergêr li pêwîsteka ku Nord destnîşan dike digunce: *Divê kod û hêman bi awayekî wisa bèn tercihkirin ku bandora teksta werger li gor fonksiyonên armanckirî yên wergerê çê bibe*. Ev terciha li jor a wergêr nabe qusûreke fonksiyonel, lê belê wergêr bi vê tercihê şeweya di bandora bûyerê ya li ser xwîner de guhertin çê kiriye. Di *haikû 6* de wergêr bi terciha xwe ya [*kulîlkek*] nebinavkirinê kulîlk di haikûya armanc de kiriye kulîlkek ji rêzê û mesafeyek xistiye navbera vebêj û kulîlkê. Di haikûya jêder de [*this flower*] kulîlkek spesîfik e û belkî jî di nav baxê vebêj de ye. Kulîlka nebinavkirî hesta mekaneke dûr a nav daristanê bi xwîner re çê dike, lê belê kulîlka binavkirî hesta malê û baxçê malê dide mirov. Di *haikû 7* de bi lêzêdekirina [*ya îro li me heyî*] bergeha vegotinê guheriye û vebêj her wekî bi ser navê her kesî [*em*] biaxive xuya bûye.

Di çarçoveya armanca giştî ya wergera haikûyan de û li gor armancên muhtemel ên wergêrê haikûnûs, hevtayî ji hêla fonksiyona edebîtiyê ve di wergeran de pêk hatiye. Wergêr, haikûyên armanc li gor cureya haikûyê, bi mijar, naverok û kompozisyoneke manendî haikûyên jêder honandiye. Di hûrgiliyên şiklî de, yên wekî dirêjîya rêzikan û bikaranîna dabir û baneşanan, wergêr bi awayekî serbest tevgeriyaye û di encamê de jî hevtayîya şiklî ya yekser pêk nehatiye. Ji hêla bandorê ve û ji hêla hûrgiliyên derbarê tecrîbe û bûyerên nav haikûyê ve hin guhertin pêk hatine û bi vî awayî jî di hin mînakên de rêya bandoreke cuda ya li ser xwînerê armanc vebûye.

Pêwîst e ku tercihên wergêr ên peyv û hevokan û şewaza wî ya wergerê bi armancên wî, bi bendewariyên texmînî yên xwînerên haikûyên wergerandî li hev biguncin û di nav xwe de hevgirtî bin. Eger em danasîna cureya haikûyê û danasîna şewaza haikûnûs Kerouac wekî armanca wergerê li ber çav bigirin, wê demê terciha wergêr a şiklî ku nêzikî şewaza haikûya Japonî ye, dê fikreke berbiçav derbarê haikûya Amerîkî de nede xwînerê Kurd. Bi heman awayî guhertina bergeha vegotinê û gelemperîkirina wekî [*me/em*] a li şûna [*min*] dê nehêle ku xwînerê armanc şewaza haikûnûs bi xwe bibîne. Wergêr kompozîsyona haikûyan ne li gor haikûyên resen, lê berevajî vê li gor haikûyên Japonî saz kiriye. Her wekî me li jor jî diyar kir, haikûyên Amerîkî ji nerîta teşeyî ya haikûyên Japonî cuda dibin ji hêla hejmara riste û kîteyan ve. Ji hêla kompozîsyona tekstê ve wergêr risteyên navîn ên haikûyan bi giştî li gor risteyên din dirêjtir kiriye, lê di haikûyên jêder de pîvanek wiha tune.

Wergêr ji bo xurtkirina bandorê di hin mînakên de serî li teknîka lêzêdekirina peyvan daye. Dryden (1992: 23) diyar dike ku wergêr hewl dide nivîskarê ku werdigerîne hindî ji dest tê xweşik û bicoş bide xuyakirin. Lê Dryden di heman demê de vê hişyariyê jî dide ku divê wergêr nivîs-

karê xwe neşibîne xwe û xasyeta wî/ê ya cudaker biparêze. Di *haîkû 7* de bi lêzêdekirina [em]ê şexsîbûna vegotinê lawaz bûye û wergêr peyameke fêrker a gelemperî wekî îma li wateya haîkûyê bar kiriye. Dema mirov Kerouac û jiyana wî ya takekesî li ber çav bigire, niyeta dayîna peyameke bi vî rengî gengaz xuya nake. Ev taserûfeke wergêr e, lê belê ev yek li haîkûnûs û konteksta haîkûyê û xasyeta vegotina şexsî nayê. Di *haîkû 1* de tercîha lêzêdekirina peyva *gor* [serbanê gor] ji ber fikara nefamkirinê ya ji aliyê xwîner ve ketiye nav haîkûyê. Di vê mînakê de wergêr li şûna ku rê bide sêwirana xwîner, bi helwesteke raveker haîkû zelal kiriye û ev tercîh jî bi helwesta wî ya wergêrê haîkûnûs li hev nehatiye.

Encam

Di vê xebatê de derket holê ku têgehên bingehîn ên teoriya C. Nordê yên wekî faktorên dermetnî û navmetnî, bandor û fonksiyona tekstê û têgeha hevtayiyê di dahûrîna teksteke werger a Kurdî de encamên şênber dabîn dikin. Di dahûrandina heft wergerên haîkûyên Jack Kerouac de, her çî qas hemî faktor di tekstê de berdest nebin jî, ev faktorên navborî ji bo dahûrandineke berawirdî ya teksta jêder û teksta armanc derfetên nirxandinên analîtîk dan me. Di dahûrandina xwe de em rastî kêşeyên kultur-spesîfîk ên berbiçav nehatin. Di dahûrandina wergeran de hat dîtîn ku fonksiyona tekstên jêder ji hêla edebî ve di tekstên armanc de jî xuya bûye. Hevtayî ji hêla fonksiyona tekstê de pêk hatiye, lê belê ji hêla kompozisyona tekstê û bandorê ve hevtayiyeye yekser pêk nehatiye.

Ji hêla armanca wergerê ve ku me di dahûrandina xwe de qal kir, wergêr cureyeye helbestê li gor şêwaza wê ya edebî transferî Kurdî kiriye. Ji hêla armanca takekesî ve jî, em gihîştin vê encamê ku paşxaneya edebî ya wergêr di teşegirtina wergerê de bandordar bûye. Wergêrê ku di heman demê de haîkûnûs e, hin taserûfên afirîner di wergerê de bi kar anîne. Wergêr di tercîhên xwe de û di ranêzikiya xwe ya ber bi haîkûyên jêder de xwedî helwesteke dureh e. Wergêr jî hêla formê ve teşeyeye pabendî nerîta haîkûya klasîk çê kiriye. Di tekstên armanc de teşeyeye nêzikî haîkûyên Japonî yên klasîk saz bûye û bi vî awayî jî girêdayî nerîta resen e, lê belê dûrî nerîta haîkûya Amerîkî ye. Ji hêla din ve jî, wergêr jî bo xurtkirina bandorê serî li teknîka lêzêdekirina peyvan daye û hin hêmanên ku di teksta resen de nîn in di teksta armanc de bi cih kirine. Ev helwest jî di çarçoveya wergera azad û afirîner de pêk hatiye û helwesteke armanc-navend nîşan dide. Ji ber tercîhên wergêr ên wekî lêzêdekirina peyvan û kirpandina hêmanên cihê dê bandora muhtemel a li ser xwînerê armanc cudatir çê be. Di hin mînakên haîkûyan de ton û hewayaya haîkûyê, bergeha vebêj û niyeta şander guheriyê û ew jî bûye faktoreke diyarker a têkildarî bandora tekstê ya ser xwînerê armanc.

Çavkanî

- Babler, Ottzo, F. (1970). "Poe's 'Raven' and the Translation of Poetry", *The Nature of Translation, Approach to Translation Studies*, No.1 ed. By James, S. Holmes, Slovak Academy of Sciences, Bratislava.
- Baker, M. (2001). *Routledge Encyclopedia of Translation Studies*, Routledge, London & New York.
- Bassnett, S. (1998). "Transplanting the Seed: Poetry and Translation", *Constructing Cultures, Essays on Literature Translation*, Multilingual Matters, Clevedon.
- Benjamin, W. (1992; 1921). "The Task of the Translator", *Theories Of Translation, An Anthology of Essays from Dreyden to Derrida*, Ed.: Rainer Schulte and John Biguenet, The University of Chicago Press, Chicago and London. Translated by Harry Zohn, pp. 71-82.
- Blyth, R. H. (1963). "A History of Haiku Volume One," *The Haiku Foundation Digital Library*, accessed June 20, 2024, <https://thehaikufoundation.org/omeka/items/show/215>.
- Devy, G. (1999). "Translation and Literary history: An Indian View", S. Bassnett et al (eds.), *Post-colonial Translation: Theory and Practice*. London and New York: Routledge. pp. 182-188.
- Dryden, J. (1992). "On Translation", *Theories of Translation An Anthology of Essays from Dreyden to Derrida*, Ed.: Rainer Schulte and John Biguenet, The University of Chicago Press, Chicago and London. Translated by Harry Zohn, (pp.17-31).
- Ghazala, Hasan S. (2015). *Literary Translation from a Stylistic Perspective*, ISSN: 2372-9740 (print) ISSN 239-311X (Online) Vol.3, No 2, 2015.
- Hakutani, Y. (2020). *American Haiku, Eastern Philosophies, and Modernist Poetics*, Lexington Books, Lanham.
- Hakutani, Y. (2009). *Haiku and Modernist Poetics*, Palgrave-Macmillan, New York.
- Henderson, Harold G. (1990). *Haiku in English*, Charles E. Tuttle Company, Rutland, Vermont & Tokyo, Japan.
- Holmes, James, S. (1970). "The Nature of Translation, Approach to Translation Studies", No. 1 ed. By James, S. Holmes, Slovak Academy of Sciences, Bratislava.
- House, J. (2018). *Translation, the basics*, Routledge, New York.
- Kerouac, J. (1961). *Collected Haikus*, (<http://terebeess.hu/english/haiku/Kerouac-Haikus.pdf>).
- Kovara LEWerger, Hejmar 6, 2024. r. 22.
- Landers, Clifford E. (2001). *Literary Translation- A Practical Guide-*, Multilingual Matters, Clevedon.
- Munday, J. (2001). *Introducing Translation Studies*, Routledge, London & New York.

- Nord, C. (1991). *Text Analysis in Translation, Theory Methodology, and Didactic Application of a Model for Translation-Oriented Text Analysis*, Amsterdamer Publikationen zur Sprache und Literatur.
- Nord, C. (1997), *Translating as a Purposeful Activity, Functionalist Approaches Explained*, St Jerome Publishing, Manchester, UK & Kinderhook (NY), USA. Manchester: St. Jerome Publishing.
- Reiss, K., Vermeer J. H. (2014). *Towards a General Theory of Translational Action- Skopos Theory Explained*, Translated by C. Nord, Routledge, London & New York.
- Reynolds, K. (2011). *Children's Literature, A Very Short Introduction*, Oxford University Press.
- Riffaterre, M. (1992). "Transposing Presuppositions on the Semiotics of Literary Translation", *Theories Of Translation An Anthology of Essays from Dreyden to Derrida*, Ed.: Rainer Schulte and John Biguenet, The University of Chicago Press, Chicago and London. pp. 204-217.
- Shi, A. (2012). *Translatability and Poetic Translation*, <https://www.translatum.gr/journal/5/translatability-and-poetic-translation.htm> (25.02.2021).
- Theado, M. (2000). *Understanding Jack Kerouac*, University of South Carolina Press, Columbia.
- Toury, G. (1995). *Descriptive Translation Studies and Beyond*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia.
- Vanderauwera, R. (2014). "The Response to Translated Literature", *The Manipulation of the Literature*, Routledge, New York.
- Wechsler, R. (1998). *Performing Without a Stage -The Art of Literary Translation*, Catbird Press.
- Woodstein, B. J. (2022). *Translation and Genre*, Cambridge University Press, UK.
- Yasuda, K. (2011). *The Japanese Haiku*, Tuttle Publishing Boston & Tokyo.